



Nirxandina Sempozyûmê
Sempozyum Değerlendirmesi
Symposium Review

V. SEMPOZYÛMA NAVNETEWYÎ YA KURDIYATÊ MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ & ALEKSANDRE AUGUSTE JABA Û MÎRASA WAN 30-31/05/2024

Sinan ÇAKAR

Sinan ÇAKAR

ORCID: 0000-0002-1088-5995 | sinancakar@yyu.edu.tr
Dr., Department of Kurdish Language and Literature,
Faculty of Letters, Van Yüzüncü Yıl University, Türkiye.

Citation/Jêgir/Atrf:

Çakar, S. (2024). Nirxandina V. Sempozyûma Navnetewî ya Kurdiyatê: Mela Mehmûdê Bazîdî & Aleksandre Auguste Jaba û Mîrasa Wan. Kurdiyat (9), 113-120. DOI: 10.55118/kurdiyat.1495360

Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:

Symposium Review/Nirxandina Sempozyûmê/Sempozyum Değerlendirmesi

Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 03.06.2024

Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 25.06.2024

Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.06.2024

Peer-Review/Hekemî/Hakemlik:

Double anonymized-Two External/Cot Nenas-Du ji derve/ Çift Taraflı Kör Hakemlik-İki hakem

Reviewing and Plagiarism/Nirxandin û İntihal:

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./ Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatîye derbaskirin./ Bu makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:

It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited./ Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsina vê xebatê de hemû rêzîkên zanistî û etik hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî tîkûz hatine referanskirin./ Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunduğu beyan edilir.

Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyên/Çıkar Çatışması:

There is no conflict of interest between the author and any parties in the article./ Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendîyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

Grant Support/Alîkarîya Darayî/Maddî Destek:

The author acknowledge that they received no external funding in support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazar, bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.

Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

Enstîtûya Zimanên Jîndar a Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê di sala 2012an de hatîye damezrandin û di sala 2013an dest bi karûbarên xwe kirîye. Heta niha gelek xwendekaran ji vê enstîtûyê pîleya masterê wergirtine û jê derçûne. Ji bilî karûbarên perwerdehîyê, di enstîtûyê de gelek xebat û organîzasyonên akademîk jî tên lidarxistin. Yek ji van xebatan jî sempozyûmên navnetewî ne. Pêşengên edebîyata kurdî weke tema di van sempozyûman de tên hilbijartin. “Sempozyûma Zanîstên Îslamê yên bi Zimanê Kurdî” weke yekemîn sempozyûm hatibû lidarxistin. Piştî vê, di sala 2021an de “II. Sempozyûma Navnetewî ya Kurdiyatê Ehmedê Xanî û Mîrasa Wî”, di sala 2022an de “III. Sempozyûma Navnetewî ya Kurdiyatê Feqiyê Teyran û Mîrasa Wî” û di sala 2023an de “IV. Sempozyûma Navnetewî ya Kurdiyatê: Melayê Cizîrî û Mîrasa Wî” ji van rêzesempozyûman bûn. Îsal jî di 30-31ê Gulanê de V. Sempozyûma Navnetewî ya Kurdiyatê bi temaya “Mela Mehmûdê Bazîdî & Aleksandre Auguste Jaba û Mîrasa Wan” hate lidarxistin. Ji hêla lijneya sempozyûmê 35 teblîx hatibûne qebûl kirin. Beşdarvan hem bi awayê onlîne û hem jî rûbirû beşdar bûn. Sempozyûm bi heşt rûniştinan û du rojan berdewam kir. Ji bilî lêkoler û akademîsyenên ji zanîngehên Tirkîyê, ji Almanyayê Philipp Bernert, Swêdê Mahir Taha, Swîsreyê Perwîz Cîhanî, Georgiyê Mariam Gureşidze, Hollandayê Michiel Leezenberg, Iraqê Tehsin İbrahim Doski û Rûsyayê Anjelika Pobedonostseva bi teblîxên xwe ve beşdar bûn.

Sempozyûm di bin berpirsiyarîya Yakup Aykaç de; Abdulhadi Timurtaş, Haşim Özdaş, Sinan Çakar, Mustafa Acar û Hacı Yılmaz ji zanîngeha Wanê bûn ku di lijneyê de cih girtin. Herwiha Zafer Açar ji zanîngeha Bingolê piştgirîya lijneyê kir. Ji bilî van kesan lêkolerên wek Mehmet Nur Yavuzer, Sami Çeliktaş, Mehmet Yıldırımçakar û M. Xalid Sadîni jî di lijneya lidarxistinê de peywirdarbûn.

Sempozyûm bi alîkarîya hin kesayet û sazîyan pêk hat. Rektoriya Van Yüzüncü Yilê ji bona beşdaran cihê mayîne û salona Cengîz Andîçê terxan kir. Herwiha VAN-TSO, Weşanxaneyê Peywend, Urartu Yapı û Vamede û hinekên din bûne sponsorê sempozyûmê.

Temaya sempozyûmê li derdora pêwendîya Mela Mehmûdê Bazîdî û Aleksandre Auguste Jaba de pêk hat û li dor vê yekê gelek pêşkêşî hatin teblîx kirin. Ne tenê li ser pêwendîya wan; li ser arşîva St. Petersburgê ya ku ji hêla van her du kesayetên ve hatîye tomarkirin; bû mijara sempozyûmê ya sereke. Serokê lijneya lidarxistinê Yakup Aykaç, gerîndeyê enstîtûyê Abdulhadi Timurtaş, alîkarê rektor Murat Kayrı, serokê VAN-TSOyê Necdet TAKVA, serokê Urartu Yapıyê Abdullah Aras, lêkoler M. Xalid Sadîni, Abdurrahman Adak û Ziya Avcı axiftinên sempozyûmê yên destpêkê kirin.

Yakup Aykaç di axiftina xwe de mebesta lidarxistina sempozyûmê anî ziman û armanca sereke arşîva St. Petersburgê derxînin holê û da ku di zanîstê cîhanî da bê nîqaş kirin. Herwiha Aykaç bal kişande ser pêwendîya kurd û rûsan. Li gorî wî, rûsan bi çavekî kolonyalîst û oryantîst xebatên kurdolojîyê lê nihêrîne û ji ber vê yekê jî serê ewil Jaba jî wek peywîr ev karê hanê hilgirtîye ser xwe. Lê pişt re her ku çûye pêwendîya Jaba û Bazîdî germtir bûye û Jaba bi dil can ev kar meşandîye. Li gorî Aykaç; Jaba berhevkarîya keresteyên kurdolojîyê bi hezkirin rêve dibe. Vê yekê jî di nameyên xwe yên ku ji bo hin hevalên xwe yên kurdolog de -ên wek Peter Lerch re şandî- tîne ziman û di van nameyan de Jaba, Bazîdî weke seydayê xwe pênase dîke.

Gerîndeyê enstîtûyê Abdulhadi Timurtaş di axiftina xwe de rola enstîtûyên zimanê jîndar anî ziman û li gorî Timurtaş bi rêya van enstîtûyan xebatên kurdolojîyê gihîştine astekî bilind. Timurtaş, Jaba û Bazîdî wek du kaşîfên gencîneya kurdî pênase kirin.

Abdurrahman Adak li ser sempozyûmê axiftineke dirêj kir û di axiftina xwe de Bazîdî li gelek alîyan ve nirxand. Adak di axiftina xwe de anî ziman ku Bazîdî bi gelek alîyan de weke pêşeng karê xwe encam daye. Cara yekem tezkîreyek bi zimanê kurmancî ku tê de qasî bîst helbestvanan cih girtiye ji aliyê Bazîdî ve hatiye nivîsîn. Berhemên edebîyata klasîk jî dîsa di vê serdemê de ji aliyê Bazîdî ve hatine berhevkerin. Bazîdî li ser folklorê kurdî, ferheng, fêrkirina zimanê kurdî, dîroka kurdî hin berhem nivîsîne. *Şerefname* wergêrandîye kurdî û li vê yekê jî nesekîniye pirtûkeke din ya li ser dîroka kurdî bi navê “Kitaba Tewarîxê Cedîdê Kurdistan” nivîsandîye. Ji ber van taybetmendîyên xwe ve Bazîdî wek muellif, mutercim, berhevkar, civaknas, etnolog û ferhengnûs e. Bi vî şiklî wek kesayetekî pîralî derdikeve pêş. Ji ber vê yekê jî li gorî Adak; xebatên Bazîdî di nava kurdan de dibe yekemîn qonaxa destpêka zanistên civakî. Adak herwiha dîyar kir ku ev arşiv bi şîyana Bazîdî ve pêk hat. Bazîdî jî ev şîyan û hêza xwe ji paşxaneya Bazîdê wergirtiye ku ev paşxane ji aliyê Ehmedê Xanî ve hatiye danîn. Li ser pexşannûsiya Bazîdî jî Adak dîyar kir ku Bazîdî feyza xwe ji Elîyê Teremaxî hildaye. Li gorî Adak xebata Jaba di wê serdemê de dikeve şûna desthilatdarîya kurdan.

Di sempozyûmê de beşdarvan û mêvanê rûmetê jî Ziya Avcî bû. Avcî wek ku tê zanîn ji bilî kar û xebatên cuda bi taybetî jî li ser vê arşivê xebitiye. Berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradîye* û *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî* ji aliyê Ziya Avcî ve hatine amadekirin û çapkirin. Avcî hem bi xebatên xwe yên di biwarê kurdolojîyê û hem jî xebatên xwe yên navborî ve ji hêla lijneyê ve weku mêvanê rûmetê hatibû vexwendin. Avcî, qala serpehatîya xwe ya amadekirina van berheman kir û di axiftina xwe de giringî û rola van çalakîyan dîyar kir ku di pêşketina edebîyata kurdî de wê bibin bingeş.

Sempozyûm di çapemenîyê de jî cîyekî berfireh girt û ji aliyê gelek ajansan ve hate şopandin. Hem çapemenîya heremî û netewî de û hem jî çapemenîya navnetewî de di derbarê sempozyûmê de gelek nûçe hatine belavkirin. Yek ji van ajansan jî Rûdaw bû. Rûdaw her dû rojên sempozyûmê jî bi eleqeyekî mezin beşdar bû bi gelek akademîsyenan re hevpeyvîn pêk anîn û nûçeyên sempozyûmê wek “Li Wanê li ser Mela Mehmûdê Bazîdî Aleksandre Jaba sempozyumek tê lidarxistin” û ev nûçe di malperên xwe de jî da weşandin. TRT Kurdîjî beşdarê sempozyûmê bû û hevpeyvînen sempozyûmê li ser malperên xwe belav kirin. Di sempozyûmê de ajanseke din jî ajansa Dengê Amerika VOA Kurmanji bû. VOA Kurmanji di “Bernameya Nû ya Heftrengê” de dîmenên ji sempozyûmê bi awayekî berfirehî dan nîşandan. Ji xeynî van ajansan, ajansên heremî yên wek Şehrivan, Vanekspres, Gazetevan û hwdli ser malperên xwe cih dane sempozyûmê.

V.Sempozyûma Kurdiyâtê Mela Mehmûdê Bazîdî & Aleksandre Auguste Jaba û Mîrasa Wan têt û tijî bû û her awayî mijar hatine nirxandin. Qadên curbicur lêkoler beşdar bibûn û vê jî rengîni û dewlendamîyek dabû sempozyûmê. Beşdarên sempozyûmê ne tenê di qada kurdîyolojîyê de bûn; ji dîroknasan heta civaknas û îlahîyatnasan ev curebûn zêdetir kiribûn. Ji ber vê yekê jî sempozyûm weke sempozyûmeke înterdîsîplîner derkete pêş. Ji bilî van mijaran; mijarên li ser edebîyatê jî ji hev cihê bûn. Hem teblîxên mijarên modern û hem jî yên klasîk û zimannasîyê jî hebûn. Di sempozyûmê de hin lêkoleran jî li ser xebatên rûsan yên kurdolojîyê teblîxên xwe pêşkêş kirin. Teblîx ne tenê kurdî bûn herwiha teblîxên tirkî û îngîlîzî jî di sempozyûmê de hatine pêşikêşkirin. Ji van teblîxan bîst û pênc heb kurdî, neh heb tirkî û yek jî bi îngîlîzî bû.

Xebata Mela Mehmûdê Bazîdî û Aleksandre Auguste Jaba di cîhana zanistî de weke koleksiyona Jaba yan jî wek arşiva Jaba tê pênasekirin. Ji ber vê çendê jî mijarên sempozyûmê her çiqas

curbicur jî bin lê piranîya wan li ser vê koleksiyon/arşîvê bûn. Em dikarin di sempozyûmê de teblîxên ku derketine pêş wiha bidin nasandin. Michiel Leezenberg bi teblîxa ya bi navê “Mela Mehmûdê Bazîdî û Rojhilatnasên Rûsan” de li ser pêwendîya kurd û rojhilatnasên rûsan sekînî. Leezenberg dîyar kir ku Bazîdî ne tenê ji bo kurdan û edebîyata kurdî herwiha ji bona rojhilatnasîya rûsan jî kesayetekî giring e. Leezenberg nihêrîna oryantalist ya li hemberî kurdan jî weke karekî kolonyalist pênase kir. Li gorî wî Bazîdî kamîlbûna xwe ji paşxaneya berîya xwe digire. Di nava kurdan de berîya Bazîdî kevneşopîya hişmendîyeke kurdî heye û Elîyê Teremaxî, Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî pêşengên vê kevneşopîyê ne. Fîrat Sözerî teblîxa xwe ya bi navê “Simmon Palas’tan Aleksandre Jaba’ya Rusya’da Kürdoloji’nin Ana Merhaleleri” li ser dîroka pêwendîya rûs û kurdan amade kiribû û di vê çarçoveyê de qala serborîya kurdolojîya Rûsyayê kir. Sözerî anî ziman ku bi awayekî giştî tê zanîn ku pêwendîya rûs û kurdan di sedsala 18an de dest pê dîke. Lê li gorî Sözerî di çavkanîyên erebî de pêwendîya van her du gelan digihije sala 943an. Bi awayekî zanistî li derdora salên 1782-83an yekem car xebatên ferhengnasîya kurdî tên kirin û ev dîrok berîya Garzonîyê Îtalî ye. Li rûsyayê merhaleyêke giring jî weşandina *Şerefnameyê* ye. Piştî şerên navbeyna Îran û Rûsyayê, ji pirtûkxaneya Erdebîlê rûs gelek berheman dibin Rûsyayê. Yek ji van berheman jî *Şerefname* ye. *Şerefname* cara ewil li Rûsyayê di sala 1862an de bi farisî tê weşandin dût re jî 1868an frensî tê weşandin. *Şerefname* herwiha ji wendabûnê tê parastin. Sözerî di pêwendîya rûs û kurdan de mînakek din jî li ser şerê Qirimê dest nîşan dîke. Di derdora salên 1870an de vê carê kurdologeke din Solomon Adamoviç Yegîzorov wek kesayeteke muhîm derdikeve pêş. Sözerî, Yegîzorov û berhema wî ya bi navê “Di Nava Kurdan 12 Sal” çavkaniya sereke ya kurdolojîya nûjen a Rûsyayê pênase dîke. Yegîzorov diwazdeh salan li Erîvanê di nava kurdan de dimîne û kurdan ji nêz ve nas dîke. Di vê hevnasînê de Yegîzorov di warê çand û ziman de gelek daneyên giring dest dixê.

Li ser xebatên kurdolojîya Rûsyayê teblîxeke din jî ji aliyê Anjelîka Pobedonostseva hatibû amadekirin. Pobedonostsewayê teblîxa ya bi sernavê “19.yy’da Rusya’da Kürt Araştırmaları” pêşkêşkir. Pobedonostsewayê helwesta rûsan ya sedsala 19an ya li hemberî kurdan anî ziman û di derbarê van xebatên wan de hin kurdolog derxistin pêş. Herçiqaq wek kurdolog neyê pênase kirin jî di vê serdemê de Aleksandre Puşkîn jî mirov dikare qal bike. Li rûsyayê cara ewil kurdên êzîdî di berhema Puşkîn ya bi navê “Rêwitiya Erziromê” de derbas dibe. Pobedonostsewayê dîyar kir ku di vê serdemê de kurdologê herî namdar û çalak jî Peter Lerch e. Necat Keskin jî wek mijar dîsa sedsala 19an hîlbijartibû. Di pêşkêşîya xwe ya bi navê “Biçavê “jihundir” û “jîderve” etnografîyaya kurdan a sedsala 19mîn: Bazîdî û Millingen” de li ser çavdêrîyên Mela Mehmûdê Bazîdî û Major Frederick Millingen ên di derbarê kurdan de axivî. Keskin nihêrîna van her du kesayetan bi du terman anî ziman û yek ji van terman *emîk* û ya din jî *etîk* e. Ji çavekî hundir ve vegotina çand û jîyana gelekî re *emîk*, ji nihêrîna çavê derve jî *etîk* tê gotin. Bi vî awayî Bazîdî dibe çavekî *emîk* û Millingen jî dibe çavekî *etîk*. Millingen di rêwitiya xwe ya Erziromê ber bi Wanê de di derbarê jîyana kurdan de gelek daneyan berhev dîke û van daneyan di sala 1870an da li Londrayê bi sernavê *Wild Life Among Koords* dide çapkirin.

“Berhemên Perwerdeya Kurdîya Kurmancî” ev teblîx ji aliyê Tahirhan Aydın ve hate pêşkêşkirin. Aydın, di vê teblîxa xwe de bala xwe dabû biwarê perwerdeyê di berhemên Bazîdî de. Aydın, bo vê yekê jî berhemên Bazîdî yê *Rahênanên Zimanê Kurdî*, *Qewa ‘idêd Serfa Kurdî (I û II)*, *Sefheî Sibyan* û *Tuhfetu’l-Xullan fi Zimanê Kurdan* ji bona teblîxa xwe wek mînak hîlbijartibûn. Ev berhemên navborî hem ji bona hînkirina kurdîya kurmancî, hînkirina alfabeya kurdî-erebî

û rêzimana kurdîya kurmancî hatine amadekirin.

Phillip Bernert di pêşkêşîya xwe de li ser berhema Mela Mehmûdê Bazîdî ya *Kitaba Tewarîxê Cedîdê Kurdistan* sekinî. Li gorî Bernert ev berhem di salên 1858-59an da hatîye nivîsîn. Berhem niha ne li ber dest e. Tenê em pê haydar in ku Jaba di derbarê vê berhemê de di salên 1867an û 1881an de hin agahîyan dide û li gorî saloxdayînên Jaba xwe ev berhem di wê serdemê de wer-gêrandîye zimanê frensî. Bernert neql dike ku Jaba vê berhemê weke berdewamiya *Şerefnameya Şerefxanê Bîdlîsî* dibîne. Mijareke din jî di derbarê *Tewarîxê Cedîdê Kurdistanê* de ji aliyê Kenan Subaşî ve hate pêşkêşkirin. Subaşî di vê pêşkêşîya xwe de li ser mijareke evînî ya Xelîl Beg û Têlî Perîşanê sekinî. Ev destana evînî li gorî ragihandinên Jaba di berhema Mela Mehmûdê Bazîdî de derbas dibin. Kenan Subaşî jî li ser vê yekê îddîa dike ku Bazîdî di nivîsîna berhema xwe ya dîrokî de ji tarîxa devkî jî istifade kirîye. Subaşî dibêje “Çimkî Bazîdî hem behsa Xelîl Beg û Gewrê û esl û esasên wan dike hem jî şêst sal piştî rûdanê stranên ku li ser navê Gewrê û Xelîl Beg ên di nav gel da belav bûne, berhev kirine û bi me ra parve kirine.” Serdar Canan jî bi sernavê “Bi çavekî Etno-Muzîkolojîk Vekolana Serhatî û Varyasyona Şekir Axa di Arşîva Jaba de” teblîxek pêşkêşî kir. Canan, bi vê pêşkêşîya xwe bi taybetî bal kişande aliyê etno-muzîkolojîya xebatên kurdolojîyê. Ji ber ku gelek caran gava dibêjin kurdolojî bêtir di hişê mirovan de ziman, edebiyat û dîrok çêdibe. Ji vî aliyê ve pêşkêşîyeke cihê bû. Wî di vê pêşkêşîyê de li ser serhatî û guhertoyên nimûneya Şekir Axa rawestîya û li dor etno-muzîkolojîyê nixandinek kir.

Mikail Bülbül jî bal kişandibû ser mijarên zimannasî yê. Bülbül, di berhemen Bazîdî yê *Tuhfetul Xîlan fî Zîmanê Kurdan, Kêşana Karên Kurdî* (1866) û *Xeberdana Zîmanê Kurmancî* ye (1865) de li ser mijara ristesazîyê rawestabû. Li gorî Bülbül ev berhemen navborî da ku Mela Mehmûdê Bazîdî Jaba hînî kurdî bike hatine amadekirin. Perwîz Cîhanî jî dîsa weke mijareke zimannasîyê li ser devokan axivî. Cîhanî bi navê “Devokên Şêwezare Kurmancî û Devoka Mela Mehmûdê Bazîdî” teblîxa xwe pêşkêş kir. Cîhanî anî ziman ku mirov dikare bibêje her eşîreteke kurdan xwedîyê devokeke cuda ye. Herwiha li gorî Cîhanî Mela Mehmûdê Bazîdî di berhemen xwe de devoka Elbakê bi kar anîye. Cîhanî herwiha dîyar kir ku ji nivîsên Bazîdî kifş dibe ku Bazîdî ji eslê xwe ne ji Bazîdê ye.

Îlyas Suvağci “Mijara Jina Kurd di Adat û Rusûmatnameyê Ekradîyeyê de” berê xwe dabû mijara jinê. Suvağci di vê mijarê de çend taybetmendiyên sereke derxistin pêş. Yek ji van mijaran jî zewac bû. Di zewaca jinan de vîneke jinan nebûye û jin bi xwesteka bav û birayên xwe zewicîne. Herçend di warê zewacê de îmajî jinan ya bi vî rengî hebe jî lê di têkilîyên rojane de jin bi mêran re mil bi mil ketine şer, car bûye birîndar bûne û car bûye hatine kuştin. Suvağci ji Bazîdî neql dike ku jinên kurdan weku jinên frensî serbest û aza bûne. Mijarek heman awayî ji aliyê Leyla Kaplanê ve hate pêşkêşkirin. “*Jin ji Alîyê Zayenda Civakî ve di Adat û Rusûmatnameê Ekradiye de*” Kaplan di teblîxa xwe de li ser zayendê rawestabû û zayend weke mefhûm rave kir. Statûya jinê bi nihêrîn û neqilkirina Bazîdî anî ziman.

Hakan Kaya, teblîxa xwe ya bi sernavê “Rewşa Sosyo-Polîtîk a Mîrektîya Kurdan di Sedsala 19an” de bal kişande mijarên dîrokî yê serdemê û rewşa Bazîdê ya wê serdemê rave kir. Li gorî Kaya Mîrektîya Bazîdê piştî şerê Çaldêranê li derdora 1578an tê avakirin. Ji sedsala 16an heta 19an heta Fermana Tanzîmatê, Mîrektîya Bazîdê vê statûya xwe didomîne. Bazîd di van sedsalan de di navbera Osmanî û Îranê piştî sedsala 19an jî di navbera Osmanî û Rûsan de dibe qada şer. Herhiwa lêkolera Nihat Gültekin jî di teblîxa xwe “Çend Belgename derbarê Mela Mehmûdê

Bazîdî da” de li ser belgenamêyên derbarê jîyan û kesayeta Mela Mehmûdê Bazîdî sekinî. Li gorî Gültekin, Bazîdî di serdema xwe de yekî navdar e. Bazîdî berîya ku Jaba nas bike di herêmede pir tê naskirin. Li ser vê yekê jî Gültekin, bîranînên rojhilatnasê polonî, di kovareke Ewropî de hatibûne weşandin, seyaheta xwe ya di derbarê bajarên wek Qers, Erzirom û Bazîdê de qala Mela Mehmûdê Bazîdî jî dike. Zaremba, Bazîdî weke melayê kurd, zanayê hêja û alimê herî mezin dide nîşandan.

Di sempozyûmê de berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî ji gelek alîyan ve hatine nixandîn. Yek ji van berhemên jî hikayetên Bazîdî bûn. Remezan Alan û Umran Altinkılıç hikayetên Mela Mehmûdê Bazîdî ji hêla form û têşeya wan ve nixandîn. Alan, “Serpêhatî û Cihê Camî’eya Hikayetan di Hikayetên Mela Mehmûdê Bazîdî de” hem hikayetên Bazîdî û hem jî di çanda kurdî de şeweya hikayetan pêşkêş kir. Wî diyar kir ku di kurdî de “serpêhatî” bo çîrokên rasteqîn hatîye gotin. Ev yek xwe di çîrokên Bazîdî de jî dide der. Di vî cureyî de mebesta vegotina tecrûbeyan heye. Ev çîrok dersa tecrûbeyekê yan jî nixekî exlaqî vedigêrine. Umran Altinkılıç jî di teblîxa ya bi sernavê “Hêmanên Vegêranên Modern di Hikayetên Mela Mehmûdê Bazîdî de” de angaşt kir ku hikayetên Bazîdî “çîrûskên” çîroka modern di hewînî û herhiwa hikayetên Bazîdî di navbera hikayetên gelêrî û çîroka modern de rola pîrekê digirin. Li gorî Altinkılıç, ev çîrok di nava xwe de homojenîyekê nahewînî. Ji aliyê form û naverokê ve curbicur in. Hin çîrok dişibin destanên kurdî û hinek jî di forma çîrûskan de ne. Lê hin çîrokên Bazîdî ji hêla dem, mekan û vegêrandinê ve “di navbera çîrokên gelêrî û çîrokên modern de wek formekî navberî xuya dikin”.

Serdar Şengül bi teblîxa xwe ya bi navê “Mela Mehmûdê Bazîdî, Ram Bam Basu Tevlîbûna li Pexşana Dinyayê” de Mela Mehmûdê Bazîdî û Ram Bam Basu Bengalî weke du kesayetên wekhev da şayesandin. Li gorî Şengül, çîroka Mela Mehmûdê Bazîdî û ya Ram Bam Basu dişibe hev. Ram Bam Basu li Bengala Hindistanê jîyaye. Rola ku Bazîdî di dîroka edebîyata kurdî de girtî Basu jî di edebîyata Bengalîyan de hilgirtîye ser xwe. Şengül diyar kir ku gelên xwedî dewlet û xwedî dîrok heman demê de xwedîyê pexşanê ne. Xwedîbûna dewlet û xwedîbûna pexşanê li gorî felsefeya Hegel ji bo gelekî asta pêşketinê dide nîşandan. Piştî ku felsefeya Hegel belav bû û weku heqîqet hat qebûl kirin gelek kes hewl dan di dîroka xwe de pexşanê peyda bikin. Lewra hebûna pexşanê xwedîbûna dewletê diyar dike. Ram Bam Basu li ser daxwaza mîsyonerê Îngîlîz William Carey dîroka qralîya Bengalê dinivîse û ev berhem ji bona Hindî û Bengalîyan dibe destpêka pexşannûsîyê. William Carey di vê derê de di dewsa Jaba de derdikeve holê.

Tehsîn Îbrahîm Doskî di teblîxa xwe de li ser berhemên Ehmedê Xanî yê di arşîva Jaba de ne sekinî. Li gorî Doskî, bi saya Bazîdî û arşîva Jaba gelek berhemên destnivîs yê edebîyata kurdî hatine parastin û gihiştine roja me. Di arşîvê de behsa çardeh helbestvanên wek Melayê Cizîrî, Elîyê Herîrî, Ehmedê Xanî, Feqîyê Teyran, Miradxaê Bayezîdî û hwd tê kirin. Doskî herwiha got ku wî, di kar û xebatên xwe de gelek mifa ji vê arşîvê hildaye. Doskî dibêje ku 55 destxetên ku yê xwe gihandî de 16 hebên wan bi berhemên Xanî ve pêwendîdar in. Di arşîvê de 8 destnivîsên Mem û Zînê peyda dibin.

Mijareke sereke jî di sempozyûmê de mijara ferhengnûsî û alfabe yê bû. Li ser vê yekê sê pêşkêşî hatine kirin. Mehmet Yonat pêşkêşîya xwe ya bi navê “Elîfba û Alfabe ya Bazîdî” de li ser alfabe yê sekinî. Yonat ji Farouk Ismaîl neql dike ku di koleksiyona Jaba nimreya “kurd “6”ê de qala alfabe yekê tê kirin. Li gorî Yonat “Lê esasê xwe de ev elîfba ne ji bo xwendina bi kurdî bi tîpên erebî lê xwendina erebî bi tîpên erebî lê bi terîfa kurdî ve hatiye nivîsîn.” Yonat herwiha

fonksiyona vê alfabeyê hem di berhemên Bazîdî de û hem jî ji bona zimanê kurdî nirxandinên xwe anîn ziman. Ümit Işık jî li ser ferhenga Jaba pêşkêşîya xwe kir. Li gorî Ümit Işık, Jaba ferhengeke Kurdî-Fransîzî, Fransîzî-Rûsî-Kurdî û Kurdî-Fransîzî-Rûsî çêkiriye. Di vê ferhengê de bi qasî 15000 peyv hene û ferheng bêpergalî hatîye amadekirin. Işık, di vê pêşkêşîya xwe de li ser termên folklorîk sekini ka çawa hatine berhevkerin û di ferhengê de çawa cih digirin. “Latînîzasyon di Ferhenga Kurdî-Fransî ya Auguste de Jaba de” Sevda Orak Reşitoğlu li ser ferhenga Jaba ya ku bi alîkarîya Mela Mehmûdê Bazîdî amade kirîye pêşkêşîya xwe kir. Reşitoğlu dîyar kir ku ev ferheng di sala 1879an li St. Petersburgê bi fransî-kurdî çap bûye. Di ferhengê de peyvên kurmancî hem bi tîpên erebî û hem jî bi tîpên latînî hatine nivîsîn. Ne tenê herfên latînî û erebî hin alfebeyên din jî herf hatine bikaranîn. Reşitoğlu anî ziman ku di vê ferhengê de zayend tune ye. Hebekî nêzê mijara ferhengnûsî û alfbayê Mustafa Aslan jî li ser wergêrvanîya Jaba sekini. Aslan teblîxa bi ser navê “Nirxandînek Giştî li ser Rêbaza Aleksandre Jaba ya Wergerên Kurdî Bo Frensî” amade kiribû û di xebata xwe de li ser rêbaza Jaba rawestabû.

Di sempozyûmê de kesayet û rola Aleksandre Auguste Jaba zêdetir lêkoler piranî li ser kesayet û berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî rawestan. Ji bilî koleksiyona Jaba hin lêkoler jî rewşa sîyasî ya serdemê weke mijar derxistin pêş û di vê çarçoveyê de jî rewşa mîrektîya Bazîdê ya wê serdemê hate nîqaşkirin.

Sempozyûm bi du rojan berdewam bû û di roja dawî de jî bi moderatorîya Abdulhadi Timurtaş, Abdurrahman Adak, Tahirhan Aydın, Michiel Leezenberg û M. Xalid Sadîni sempozyûm nirxandin. Tahirhan Aydın qala serborî û serencama arşîva Jaba kir û daxwaz û hêvîyên xwe anîn ziman ku berhemên di vê arşîvê de weke faksimile ji aliyê Wezareta Çandî ya Turkiyeyê ve bîn çapkirin. Aydın, pêşnîyaz kir ku sala bê li ser *Şerefnameyê* û dîroka kurdan sempozyûmeke nû bê lidarxistin. Abdurrahman Adak dîyar kir ku berîya van berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî kurd di çavên Ewropîyan de weke miletekî folklorîk dihatin dîtin. Lê piştî van berheman Ewropîyan fehm kir ku kurd xwedîyê çandekî nivîskî ne. Li gorî Adak, Mînskî di amadekirina mijara kurdan ji bona Ansiklopedîya Îslamê de paşxane û çavkanîya xwe xebatên Bazîdî wergirtîye. Li gorî dîyarkirina Adak, ger mirov bixwaze qala çand, ziman û edebîyata kurdî bike divê mirov vê yekê weke berîya Bazîdî û piştî Bazîdî dabê bike. Di serdema klasîk de vekolînên herî ilmî û zanistî ji aliyê Bazîdî ve hatine pêk anîn. Li ser vê xalê Adak îddîa kir ku xebatên ku Bazîdî pêkanîne di wê serdemê de di edebîyata tirkî de jî nehatine dîtin û kirin. Abdulhadî Timurtaş jî li ser rewşa akademîya kurdî rawesta û li gorî wî xebatên akademîya kurdî ghiştîne asteke bilind. Herwiha Timurtaş bang li qadên zanistên din jî kir; gotar û nivîsên xwe bi kurdî binivîsin da ku di wan qadan de jî termînolojîyeke kurdî ava be.

Encam

Di vê sempozyûmê de Mela Mehmûdê Bazîdî wekî pêşeng û nirxekî edebîyata kurdan ê veşartî, ji her alî ve hate nirxandin. Ev xebat ji bo nasîn û danasîna koleksiyon Jaba hêz û hêvîyên mirov zêde dike. Lewra gelek mijarên giring û gelek teblîxên hêja hatin pêşkêşkirin. Mirov dikare bibêje ku Enstîtûya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê di vê qadê de kedekî mezî derxistîye holê. Bi rêya van rêze sempozyûman hem mijar û şahkarên edebîyata kurdî tîn guftûgokirin û hem jî rol û rista wan di zanista akademîyê de tê pêşkêşkirin. Ji keynî vê yekê di vê sempozyûmê de jî me dît ku ev çalakîyên edebî yên bi vî rengî bi xwe re tevgerê jî ava dike. Lewra ji gelek zanîngehan lêkolerên kurd û kurdologên bîyanî tîn ba hev û hevnasînek pêk tê.

Ger em li ser vê sempozyûmê bibêjin, beşdarîbûna Michiel Leezenbergê hollandî û Anjelîka Po-bedonostseva'ya rûsî mirov dikare weke mînak nîşan bide.

Curebûna teblîxan jî nîşan da ku Mela Mehmûdê Bazîdî kesayeteke giring e û karê ku bi Aleksandre Auguste Jaba re jî kirî ji bona dîroka edebîyata kurdî karekî pîroz e. Bi vî awayî jî derkete holê ku Bazîdî her çend bi alîkarî û piştgirîya Jaba ev karê hanê pêk anî be jî lê mirov dikare bibêje di warê çand, edebîyat û dîroka kurdî de Bazîdî jî şareza bûye.

Wek encam em dikarin bibêjin ku di vê sempozyûma navneteweyî de li ser mijarên wek dîrok, cîvaknasî, mûzîk, çand û edebîyata kurdî gelek pêşkêşîyên giranbiha hatine vegotin. Herwiha hem jî hêla beşdaran ve û hem jî ji hêla naverokê ve ev sempozyûmeke dewlemend bû. Em hêvîdar in ku dê ev rêze sempozyûm di sala bê jî berdewam bibe.

ÇAVKANÎ

Vîdeoyên YouTubeê yên V. Sempozyûma Navneteweyî ya Kurdiyatê Mela Mehmûdê Bazîdî & Aleksandre Auguste Jaba û Mîrasa Wan.

https://www.youtube.com/watch?v=eYELJditeu4&t=64s&ab_channel=KurdiyatDergisi (23.06.2024).

https://www.youtube.com/watch?v=u0V3CzgxHWU&t=37s&ab_channel=KurdiyatDergisi (23.06.2024).

https://www.youtube.com/watch?v=9oMQFnaaBJs&t=286s&ab_channel=KurdiyatDergisi (24.06.2024).

https://www.youtube.com/watch?v=ef6EN_ABpYY&t=5s&ab_channel=KurdiyatDergisi (24.06.2024).

https://www.youtube.com/watch?v=j_G7sHTd9qY&ab_channel=KurdiyatDergisi (25.06.2024).

https://www.youtube.com/watch?v=5f9OeVpMgVg&t=3s&ab_channel=KurdiyatDergisi (25.06.2024).

https://www.youtube.com/watch?v=mbwNBUI608o&t=13s&ab_channel=KurdiyatDergisi (26.06.2024).

https://www.youtube.com/watch?v=bWGbrb8w1lc&t=2s&ab_channel=KurdiyatDergisi (26.06.2024).

https://www.youtube.com/watch?v=s1CEtxWIDSI&t=4s&ab_channel=KurdiyatDergisi (27.06.2024).

https://www.youtube.com/watch?v=kMvxO1A4_Jw&t=666s&ab_channel=KurdiyatDergisi (27.06.2024).